

Êşa Zirav, agahdariyên ji bona nexweşan 1 Tîrmeh 2004

Agahdariyên ji bona nexweşan û dîrektîfên gelemperî. Kurte-zanîna Dixtorê Nexweşiyên Jêkvegir.

Raguheztiin

Êşa zirav ji bakteriyên çê dibe. Gava kesekî bi êşa zirav nexweş bikuxe, ev bakteriyên ko ji cîger der tîn dikevin hewayê û paşê kesekî din gava helma xwe digire ev bakterî dikevin hundirê wî. Di navbera ji vê nexweşî girtin û ketina vê nexweşiyê gelekî wext heye.

Deramanên kêrhatî hene

Bo êşa zirav deramanên kêrhatî hene, lê ev derman hetanî dawiyê nabin çare. Ji ber vê hindê hin wext dixwaze hûn bi temamî jê xelas bin.

Gelekî girîng e ko hûn di vê kêliyê da kesên din nexweş nakin. Û cardin gelekî girîng e ko divê hûn deramanên ko dixtorê we di reşetaya we da nivisiye bigirin û divê bo saxbûna we çî tedawî hene hemiyan hûn temam bikin. Gava hûn ji vê nesaxiyê xelas bin hûn êdî dikarin jiyana xwe bi asayî dom bikin. Lê divê paşê di demek nêz da xwe ji nexweşiyên dîr bixînin.

Êşa zirav ji bo civatê weke metirsî û xederiyek têye ditîn û divê em 'şopandina jêkvegirê' bi rê ve bibin da ko kesên ji vê nexweşiyê girtine bibînin. Malbata we û kesên li der dora we bi rêkûpêk ji bona testkirina êşa ziravê û carinan jî bo x-rayê hestiyên têne bang kirinê. Divê hûn tevî 'şopandina jêkvegirê' bin û ev kesên ko hatine bangkirinê divê bihêlînin li ser wan çî azmûn pêdivê bêne meşandin.

Ji bona ko kesekî din hûn nexweş nekin divê hûn gur li van dîrektîfên bingehîn bikin:

- Divê hûn li ser soza xwe bimînin û dixtorê xwe bibînin û testên ko dixtorê we pêwîst dibînin ji bo we hilbigirin.
- Hûn nikarin tedawiya xwe bêyî dixtorê xwe biguherînin.
- Heke hûn dixwazî dixtoran biguherînin, divê hûn ji dixtorê xwe ra bêjin.

Gava hûn nexweş in, divê hûn

- Nehêlînin ko kesekî din nivînen we bi kar bîne.
- Nerin nik kesekî zarok an jî jinên ducanî an jî kesekî ko aşî nebûne an jî kesekî ko lawaz in ko bikevin nexweşiyê.

Hûn dikarin li mala xwe bimînin an jî herin derva; lê kesekî ko ne ji malabata we ne têkilî pê ra daneynin. Banî mêvanan mekin ko werin mala we.

Hûn mecbûr in ko li pey van dîrektîfan herin

Bi Qanûna Nexweşiyên Gehînbar, jêkvegira ko hûn dikşînin bo civatê weke metirsî û xederiyek têye ditîn. Ji ber vê yekê hûn mecbûr in ko li pey ferman û gotinên dixtorê xwe herin. Bi daxwaza we, Dixtorê Nexweşiyên Jêkvegir yê li Devera we li ser van dîrektîfan cardin jî difikire. Hetanî ko ji wan azmûnek bêne birêvebirin, divê hûn gur li van dîrektîfên ko danine we bikin. Navnîşana Dixtorê Nexweşiyên Jêkvegir ya Li Devera we ev e: